

Hesen Şerefî

*“Kongireya neteweyî dikare navmala Kurd teba û yekgirtî nîşan bide”* …» 3

**Seyîd Necmedîn Haşimî:**

*“Heyamê çil rojan em di xizmeta Dr. Qasimlo de bûn, û ew roj rojên herî xweş ên pêşmergatiya min bûn”* …» 8



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ


Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (211) 06-08.2013 Buha (150) Tûmen

**Pêşwazî ji 25’ê Gelawêjê erkek neteweyî ye**

Em hêdî hêdî nêzî 25’ê Gelawêjê salvegera avakirina PDKÎ dibin. Ew roja ku têde partiyek ji dayîk bû û mîna tîrêjên rojê, esmanê tarî yê Kurdistanê ronahî kir, û hêz û bawerî da gelê Kurd. Lewra bi bîranîna vê roja pîroz bi her awayekê ku ji dest me tê, erkek neteweyî û emegdarbûna bi xwîna wan şehîdan e ku di riya azadî û armancên PDKÎ de canê xwe gorî kirin.

**Desteya Weşana Agirî**

## Şêrko Bêkes koça dawiyê kir



**Helbestvanê navdarê Kurd Şêrko Bêkes di temenê 73 saliyê di Swîdê dekoça dawiyê kir**

Roja 04.08.2013’an Şêrko Bêkes helbestvanê navdar ê Kurd di yek ji nexweşxaneyên Swîdê de bi sedema nesaxiya pençeşêrê koça dawiyê kir.

Şêrko Bêkes kurê helbestvanê Kurd Fayiq Bêkes e, û di sala 1940’î li bajarê Silêmaniyê ji dayîk bûye, û di sala 1986’an de çûye derveyî welat, û ji sala 1987 heya 1992’an li Swîdê jiyan kiriye û piştre vegeriyaye Kurdistanê.

Navbirî bi yek ji helbestvanên nûxwaz ê hevçerz ê Kurd tê hesibandin ku xwediyê çendîn dîwanên helbestan e û gellek ji helbestên wî bo ser çendîn zimanên zindî ên cîhanê hatine wergêrandin.

## Kongireya Neteweyî mizgîniya aştî û pêkvejiyana Kurdan



**Partiyên her çar beşên kurdistanê bi merema pêkanîna Kongireya Neteweyî ya Kurd li Herêma Kurdistanê kom bûn û şanda PDKÎ bi serperestiya rêzdar Mistefa Hicrî sekretêrê giştî yê PDKÎ di vê kombûnê de beşdar bû.**

Li gor nûçegehaniyan, roja Duşemî 31’ê Pûşper (22.07.2013) kombûnek berfireh bi serperestiya rêzdar Mes’ud Barzanî serokê herêma Kurdistanê û bi beşdariya partiyên herçar beşên kurdistanê bi merema bas li ser pêkanîna Kongireya Netewî ya Kurd û diyarîkirina heyetek 21 kesî wek Desteya Amadekar a Kongireya Netewî li bajarê Hewlêr pêk hat.

Di vê kombûnê de piştî gotara Serokê Herêmê, nûnerên partî û aliyên siyasî tevî vê ku kombûn û pêdiviya pêkanîna Kongireya Neteweyî û rewşa her yek ji beşên kurdistanê xistin ber basê, herweha di vê kombûnê de biyar dan ku 21 kes wek heyeta amadekar a Kongireya Neteweyî bên diyarî kirin û heya di mehekê de rewşa pêkanîna kongirê amade bikin.

Nûnerê PDKÎ wek yek ji endamên 21 kesî yê amadekarê kongirê hat diyarîkirin. Piştî çend civînan biryar hate dan ku ew kongire di roja 24.08.2013’an de bê girtin. Her di vê derheqê de me gotûbêjek jî bi rêzdar Hesen Şerefî re pêk aniye, ku berfirehiya wê di rûpela 3’ê de hatiye.

Sergotar

# Rûhanî û reform!

Şehab Xalidî

Rêûresma qebûlkirina hukmê serkomariya Rûhanî û piştî wê jî rêûresma sondxwarina wî birêve çû, û piştî wan rêûresman ew divêt navê wan wezîrên ku bo kabîneyê diyarî kirine bibe parlementoyê û li wir dengê piraniya nûneran wate dengê hitbarê bo wan wergire.

Bê guman di sîstema Rejîma Komara Îslamî ya Îranê de hemû hilbijartinek pêştir ji aliyê Xamineyî û kesên derdora wî ve weha tên endazyarîkirin ku ne tenê zirar bo wan û deshilata wan tunebe, belkû serkomar jî wek pêlîstokekê di destê wan de be, û heta endazyarîkirina piştî hilbijartinê jî heye, wate piştî vê ku hilbijartin bidawî bibe, û ew bikarin kesê cihê baweriya xwe ji sindûqê derbixin, di dema danîna wezîran de jî rêber aliyê kêm 5 postên kilîdî bixwe diharî dike, lewra gellek zehmet e ku alîgirên Rûhanî û kesên dangê xwe danê bikarin bigîjne wan hêvî û daxwazan, ku her bi wan sedeman dengê xwe danê.

Belê biryara yekem û dawiyê di destê rêber de ye û dana diruşman bi qazancê xelkê welat di çarçoveya vê sîstemê de qet aliyê piraktîkî bi xwe ve nagre. Rûhanî di demekê de hatiye ser kar ku rejîm bi tewahî îzole bûye û hewcehî bi nermrewiyekê heye bona derxistina welat ji kirîzek weha de, û rewşa aborî ew qas xirap e ku hewcehî bi girtine pêşê ya siyasetek weha ye ku bikarin barê giran yê wan tehrîman li ser xwe hilgirin û bêhnek rehet vedin.

Lê gelo ma dema xwe Xatemî bi vê giraniya xwe û piştqahîmiya bi 20 milyon dengî karî yan xwast ku karek weha bike, heya ku Rûhanî bixwaze yan bikare pêngavek weha hilgire? Herçend bersivdana bi vê pirsê ne zehmet e, lê rojên pêşiya me û bûyerên pêşiya me wê zêdetir vê pirsê rohn û zelal bikin.

# Komkujiya xelkê Kurd li Sûriyê biryara cîhada Xomeynî bi dijî gelê Kurd bi bîr tîne



**Kurdistanmedia: Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi boneya bûyerên wan dawiyane ên Kurdistana Rojava daxuyaniyek bilav kir, ku deqê daxuyaniyê weha ye:**

**Hevwelatiyên rêzdar!**

**Ogirên mafên mirovan!**

Heyamek berî niha di Sûriyê eniyeke ser bi rewta binajoxwaz û tundrew ya Îslama cehadî bi dijî hêzên Kurdî hewara xwe bire ber bingehên ayînî û fetwaya cehadê bi dijî neteweya Kurd li Kurdistana Sûriyê derkir, û biryar dan ku rêtina xwîna Kurdan û jin û zarokên wan helal e bo terorîstên wan, û êrîşeke hovane bi dijî neteweya Kurd û xelkê asayî û bê çek û bê êvirgeh dest pê kir. Di doma vî şerê cehadî û bi nav muqedes li jêr navê ayînê Îslamê de, çekdarên ser bi rewtên tundajo dest kirin bi komkujiyê û li çendîn cihên Kurdistana Sûriyê tevî rehîngirtina xelkê asayî û jin û zarokên Kurdan, çendîn tawanên dijî mirovî jî afirandin û xelkê çend gundan bi hevre gullebaran kirin, û kuştareke bi kom rê xistine ku tawanên hêzên rejîma Xomeynî piştî derkirina biryara cîhadê bi dijî gelê Kurd tîne bîra me.

**Kom û komeleyên mirovdost!**

Di demekê de ku hinek ji rewtên selefî cîhadî ên tundrew li Sûriyê tawanên weha bi dijî neteweya Kurd birêve dibin, bêdengbûna li hemberî wan reşekujî û tawana şer de, reng û rûyê alîgirî ji tawanê bixwe ve digre û em daxwazkar in ku tevî şermezarkirina wan tawanan alîkariyên mirovî ên bilez bigehînne vî xelkî û li hemberî terorîstan û tawanbaran de piştevanî ji xelkê bê tawan ê Kurd li Sûriyê bê kirin, û herweha bi bîra hêzên Kurdî li Sûriyê bînin ku dijminê Kurd yekgirtî û yekdest e û tenê bi tawana Kurdbûnê wan dikujin, lewra em daxwazê li tev hêzên Kurdî dikin ku bi qebûlkirina yektir û bi hevahengî û alîkarî û bi rêz û hurmeta yeksan û hevta bo parastina gelê me li Kurdistana Sûriyê û bo birêvebirina herêmê pêngavan hilgirin û wan bûyeran nîşan dan ku li jevbilavî û qebûlnekirina yektir tenê dijmin qazancê lê dike.

**PDKÎ**
**Deftera Siyasî**
**12.05.1392**
**03.08.2013**

## Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDKÎ bi boneya koça dawiyêa helbestvanê navdar ê Kurd Şêrko Bêkes

**Hemwelatiyên rêzdar!**

**Civatên xelkê Kurdistanê!**

Roja Yekşemî 13'ê Gelawêja 1392 (04.08.2013) mixabin dilê mezin û pirr ji evîn yê helbestvanê navdar ê Kurd Şêrko Bêkes di yek ji nexweşxaneyên welatê Swîdê ji lêdanê ket û bo hertim xatirê xwe ji jiyan û ji ogir û evîndarên helbest û wêjeya Kurdî û bi giştî ji xortên neteweya Kurd xwast.

Jidestçûna Şêrko Bêkes wek şarezayeke wêjeya Kurdî û helbestvanekî naskirî ê Kurd bêguman zirareke mezin li samana wêje û rewşenbîriya neteweya Kurd û xemeke giran e ku giranî xiste ser dilê evîndar û welatperwerên Kurd.

Şêrko Bêkes yek ji sitûnên parastina ziman û kultura Kurdî û di rastî de xûdîka di cihê xwe de ya helbesta hevçerx ya Kurdî û xizîneyeka peyvên resen ên Kurd û wergirê xelata wêjeyî ya "Toxoloskî" bû. Mamosta Şêrko Bêkes di jiyana çand û qada helbest û wêjeya Kurdî de siwar çak û di heyamê jiyê xwe de jî çendîn dîwanên helbestan berhem anîne, ku dawî dîwana helbesta wî "lezê bike, mirin wê bigîje" bû.

PDKÎ jidestçûna mamosta Şêrko Bêkes wek zirarekê bo tewaya xortên neteweya Kurd dizane, û li ser vê baweriyê ye ku valahiya nemana wî helbestvanê mezin li qada wêjeya Kurdî de bi hêsanî tijî nabe.

Di heman dem de PDKÎ bi boneya koça dawiyê ya Şêrko Bêkes em sersaxiyê dibêje tewaya xortên neteweya Kurd, helbestvan û wêjevanên Kurd , û dost û nasyarên wî û malbata rêzdar Şêrko Bêkes, û xwe di vê xema giran de bi hevpar û beşdar dizane û sebrê ji hemû aliyekê re bi hêvî dixwaze û hurmetê ji yad û yadgarên bi nirx ên wî digre.

**Riha wî şad be**
**PDKÎ**
**14.05.1392**
**05.08.2013**

**Roja 31'ê Pûşperê (22.07.2013) yekemîn kombûna amadekarî bo kongireyek neteweyî li herêma Kurdistana Başûr de birêve çû, û biryar hate dan ku lêjneyek 21 kesî bi navê lêjneya amadekarî bê avakirin. Di vê derheqê de me hevpeyvînek bi rêzdar Hesen Şerefê cihgêrê sekreterê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê re pêk anî ku eva deqê vê hevpeyvînê ye:**



Hesen Şerefî

**1- Di çend rojên borî de nûçeya pêkanîna yekemîn kongireya neteweyî a Kurd, bi beşdariya hemû partî û aliyên siyasî ên her çar perçên Kurdistanê bûye rojeva basa medyayên Kurdî û heta ên derve. Di vê derheqê de kerema xwe bas ji vê bikin ku bîrokeya pêkanîna kongireyek weha vedigere bo kengê, û dikare tu bandorek hebe li ser rewşa niha ya neteweya Kurd?**

Bersiv: Bîrokeya yekdengî û yeksitratejîbûna xortên netewa Kurd, bîrokeyek kevnar e û bi awayên curbicur hewl jêre hatine dayîn, lê her tim bi sedema rewşa herêm û rewşa Kurd di her perçeyek Kurdistanê de û herweha pîlan û karşikêniyên welatên zal bi ser Kurdistanê de, bi ser neketiye.

Heya du sal berî niha cardin ev hewcehiya han ji aliye serokê herêma Kurdistanê ve ket ber bas û hewlên zaf jêre dan û heya nêzîkatiya pêkanînê jî hewlên curbicur berdewam bûn, lê mixabin vê carê jî tevî asteng û pirsgirêkên curbicur berbirû bûn. Berî du heftiyan cardin mijara han ji aliyê serokê herêma Kurdistanê birêz Mes'ûd Barzanî ve ket ber bas û her di vê peywendiyê de name bo 40 partî û rêkxirawên herçar perçên Kurdistanê şand û têde daxwaz hatibû kirin ku di kombûnek berfireh de bi amadebûna wî yê rêzdar beşdar bin. Ewa bû ku hejmarek ji partî û rêkxirawên çar perçên Kurdistanê û her yek bi heyetek du kesî û di pileyên bilind ên rêkxiraweyî de, demjimêr 2'ê piştî nîvro a roja 31'ê Pûşperê (22.07.2013) di kombûnê de amade bûn. Di vê kombûnê de aliyên siyasî ên her çar perçên Kurdistanê, rewşa Kurdistana xwe xistin ber bas û amaje bi rewşa giştî a navçe û cîhanê kirin û di encam de li ser pêkanîna yekemîn kongireya natewî a Kurd yekdeng bûn.

**Li derveyî Kurdistanê jî kongire dikare hebûna Kurdan di kom û civînên navneteweyî de berfirehtir, yekdengtir û yek daxwaztir bike, û Kurdên her parçeyekê di nav wan kom û civînan û di bîrûraya giştî de soz û piştevaniya xwe bo Kurdên parçeyên din nîşan bide, û navmala Kurd teba û yekgirtî nîşan bide.**



Bi liberçavgirtina yekdengî û hewcehiya pêkanîna kongireya netewî a Kurd, kongirê biryar da ku lêjneyek 21 kesî bi navê lêjneya amadekarî bê avakirin û piştre ew qonax jî birêve çû.

Eva ku kongire dikare çi bandorekê bixe ser rewşa Kurd, hewce ye ku bêjim, nabe em li benada mo'cîzeyekê bin, jiber ku yekem ceribandina Kurd e, lê bêguman bandorê dixe ser xortên Kurd, û peywendiyên di navbera partî û aliyên siyasî di herçar perçên Kurdistanê de bêtir û saxtir dike.

Di warê navnetewî de pirsa kurd yekdeng dixe ber çav û bi awayekê piştewaniya Kurd ji Kurd li herçar perçên Kurdistanê derdixe holê, lewra di despêkê de pêngava han dikare bi erênî were nirxandin.

**2-Şêwe û mîkanîzma beşdariya hêz û aliyên siyasî li parçeyên Kurdistanê di vê kongireyê de bi çi şêweyekê ye û para her parçeyeke Kurdistanê li gorî çi pêverekê di vê kongirê de hatiye diyarîkirin?**

Besiv: Şeweya dabeşkirina wan 21 kesan bi vî awayî bû ku, ji bo Bakûr bi KNK'ê ve 7 kes, Başûr 5 kes, Rojhelat 5 kes û Rojava 4 kes hate diyarîkirin. Eva ku peywendî bi Kurdistana Rojhelatê ve heye ev e ku 5 kesên Rojhelatê bi hilbijartinek azad û bi beşdariya 9 aliyên beşdar hatine hilbijartin, lê di parçeyên din de bi awayek din hatine diyarîkirin.

**3-Hinek ji aliyên siyasî û hûrde partiyan derheq şêweya diyarîkirina nûnerên parçeyên Kurdistanê û bi taybetî rojhelatê Kurdistanê di medyayan de rexne girtine, hûn çawan bersiva wan rexneyan didin?**

Bersiv: Derheq şêwaza diyarîkirina 5 kesên Kurdistana Rojhelat, baştir û dirustir ji hilbijartinê dikare çi be? Lê xwezayî ye ku di her hilbijartinekê de aliyek ku nehê hilbijartin nerazî ye, lê girîng ev e ku hilbijartin demokratîk bûye û her 9 aliyên beşdar jî berî dengdan û deng wergirtinê, razî bûne û heta beşek ji wan ku piştî hilbijartinê ragehandin ku nerazî ne, pîrozbahî ji hilbijartiyan kirin. Ya ku pêwendî bi parçeyên din ve jî heye, baştir ew e ku bixwe şêweya parvekirinê bas bikin.

**4- Ev kongire heya çi qasekê dikare li ser hevkêşeyên siyasî ên Kurd di nav sînoran û li derveyî sînorên her çar perçeyên Kurd-**

Dom R: 4

# Doma R:3ê

**istanê bandorê danê?**

Besiv: Ew kongireya yekemîn kongire ye ku piştî wan hemû salan birêve diçe, lewra bê guman bê kêmasî nabe, û çavnihêriyek weha nikare rast û dirus be, ku encameke gellek mezin û bi bandor lê bikeve, yan mo'cizeyekê bike, lê di navxwe ya Kurdistanê û di parên din ên Kurdistanê de dikare bibe hêvina tebahiyê, û lihevnêzîkbûna hizb û aliyên siyasî dikare vê çandê cihgir bike ku kêşe û nakokiyên di navbera partî û aliyên siyasî di her parçeyekê de di gel partî û aliyên parçeyên din ên Kurdistanê ji riya diyalogê û bi şêweyek serdemiyane ve bihê çareserkirin, û şerê Kurd bi dijî Kurd bi ne rewa bihê zanîn.

Piştre dikare ku şêweyek ji piştevaniya Kurdan li parçeyekê de, ji Kurdên perçeyek din zêdetir bike, û pirsa Kurd li her parçeyekê wek beşek ji pirsa Kurd bi giştî çav lê bihê kirin, û Kurdên her parçeyekê li pêvajoya xebat û pêwendiyên xwe de berjewendiya xwe li zirargehandina bi berjewendiyên Kurdên parçeyên din de nebîne.

Li derveyî Kurdistanê jî kongire dikare hebûna Kurdan di kom û civînên navneteweyî de berfirehtir, yekdengtir û yek daxwaztir bike, û Kurdên her parçeyekê di nav wan kom û civînan û di bîrûraya giştî de soz û piştevaniya xwe bo Kurdên parçeyên din nîşan bide, û navmala Kurd teba û yekgirtî nîşan bide.

**5- Peyama vê Kongireyê bo neteweya Kurd û welatên cîhanê û bi taybetî welatên cîran ên Kurdistanê çî ye?**

Bersiv: Peyam, peyama aştî û lihevhatinê, û tebahî û dilsozînîşandan bo hemû Kurdan e. Peyama bo bîrûraya giştî ya welatên cîhanê û cînar ên me ew dibe ku Kurd dîrokek dûr û dirêj ji cînayetên bi xwîn heye, û haşa ji hebûna wan tê kirin, mafê Kurdan tê binpêkirin, daxwazên siyasî, însanî û neteweyî bi tundî, bi tepeserî, zîndan û îdam û terorê tê bersivdan. Bi giştî kongire wê rewayiya xebata Kurdan bixe berçav, banga jiyanek serdemiyane, û tolerans di gel neteweyên din dike, û dibêje wan ku Kurd hez dike kêşe û nakokî bi riya aştiyane bêne çareserkirin.

Bidestvehatina mafên demokratîk û neteweyî ên Kurd bi zirara tu gel û welatekê nabe, berevajî dibe sedema aramî û berevpêşveçûna welatek û heya herêmê jî.

Lewra hewce ye ku rewşenbîr û bîrûraya giştî di hemû welatan de piştevaniyê ji Kurd û daxwaziyên Kurdan bikin. Kurdan tu carî êrîşî ser tu neteweyekê nekiriye, belkû bûye armanca êrîşan û mafê wê hatiye binpêkirin, ji şer û xwînrêjiyê hez nekiriye belkû şer bi ser de hatiye sepandin û xwîna wan rijiyaye, peyamek ku vê rastiyê tîne berbas, di rastî de reng û rûyê mirovê Kurd nîşan dide.

**6- Gelo ev kongireya kongireya dawî ye, yan li salên bê de jî berdewam dibe?**

Bersiv: Rewş bo pêkanîna vê kongireyê niha çiqas giring e, ew qas jî pêkanîna kongireyek din piştî vê kongireyê dikare bandora xwe hebe, û bo her rewşekê kongireyek taybet divêt bihê pêkanîn û lewra ez hêvîdar im, ew kar û ew hewcehiya di vê kongireyê de berçav bê girtin.

**7- Mîkanîzmên îcrayî (birêvebirinê) ên vê kongireyê çi ne?**

Bersiv: Heya niha mîkanîzmên birêvebirinê yên vê kongireyê bas lê nehatine kirin, lê xwezayî ye ku her kongireyek ku peyam û biryar û helwest hebe, hewce ye ku piştî kongireyê jî nawendek weha jî hebe ku piştî bidawîhatina kongireyê bo cîbicîkirin û şopandina wan armancan karê berdewam bike, û rapora kar û encama tekoşînê bide kongireyê, û kêmasiyan destnîşan bike û ji wan ceribandinan bona baştir û bi bandortir birêvebirina kongireyên din mifah jê bê wergirtin.

**8- Mîkanîzmên berdewambûna vê kongireyê û şopandina daxwaziyên vê kongireyê ji welatên cîhanê û bi taybetî ew welatên ku Kurdistan bi ser de hatiye parvekirin çawa ye?**

Bersiv: Her wek di bersiva pirsa pêştir de min bas kir, carê di vî warî de bas nehatiye kirin, jiber ku ew mijar û bas taybet bi biryara dawiyê ya lêjneya amadekar nine, belkû eva kongire bixwe ye ku di vî warî de bas dike û biryarê dide.

**9- Hûn rol û pêgeha partiyên Kurdistana Rojhilat û bi taybetî PDKÎ di vê kongireyê de çawan dinirxînin?**

Bersiv: Asayî ye ku hekî PDKÎ pêkhatina vê kongireyê bi baş nezanîba, yan hest bi vê yekê kiriba ku di vê kongireyê de rolek berçav tunabe, beşdarî nedikir. Partî û aliyên din ên siyasî ên Kurdistanê jî her bi vê çavê li kongireyê dinêrin.

**10- helwesta welatên Îran, Îraq, Turkiye û Sûriye di vê derheqê de çî ye? helbet bi berçavgirtina vê ku hinek ji aliyên siyasî weha şirove dikin ku ev kongire destpêkek e bo avabûna Kurdistaneke yekparçe?**

Bersiv: Heya niha ji bilî hikumeta Turkiyê ku di helwesta xwe de hêviya vê yekê xwastiye ku vê kongireyê peyama aştiyê hebe, hikumetên din bi awayek fermî tiştek negotine, bê guman hekî bi berçav nerizayetî jî ji xwe eşkere nekiribin, di rastî de pê kêfxweş nînin, û dûr nine ku Komara Îslamiya Îranê bone têkdan yan sernekevtina wê pîlanan jî danê.

## Heyeteke PDKÎ di pirse û serxweşiya Felekedîn Kakeyî de beşdarî kir



**Kurdistanmedia: Şandeke PDKÎ li pirse û sersaxiya Felekedîn kakeyî nûser û siyasetvanê Kurdistana Başûr li bajarê hewlêrê de beşdarî kir.**

Li gorî nûçeya malpera Kurdistanmedia şandeke PDKÎ bi serperestiya birêz Mihemed Nezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî di pirse û sersaxiya Felekedîn Kakeyî de beşdarî kir.

Mihemed Nezîf Qadirî bi nûnertiya birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ sersaxî da Nêçîrvan Barzanî serokwezîr û cihgirê serokê PDK'ê û hêvî xwast ku cihê wî biheşa berîn be.

Rehmetî Felekedîn Kakeyî sala 1322'an (1943) li bajarê Kerkûk li Kurdistana Başûr ji dayîk bûye û kesayetiyê naskirî ê Kakeyiyan û endamê pêşîn ê Mekteba Siyasî a PDK'ê û wezîrê pêştir ê Wezareta Rewşenbîrî a Hikumeta Herêma Kurdistanê bûye.

Felekedîn kakeyî roja 8'ê Gelawêja 1392'an (30.07.2013), li temenê 70 saliyê li bajarokê Pîrmam li Kurdistana Başûr de koça dawiyê kir.

## Kongireya 7'ê ya YCDKÎ bidawî bû

**Kurdistanmedia: Kongireya YCDKÎ, piştî çar rojan karê berdewam bi hilbijartina birêveberiyek nû di rewşek demokratîk de bidawî hat.**



Di dema hilbijartina endamên birêveberiyê de ji sîstema "Kota" bo keçên endam mifah hate sitandin û keçan şiya ku bi awayek berçav di birêveberiya ciwanan de cih bigrin.

Piştre di yekemîn civîna desteya birêveberiya hilbijartî ji aliyê Kongireya 7, rêzdar Foad Xakîbeygî bo carek din wek sekreterê giştî ê YCDKÎ hate hilbijartin.

Roja 9'ê Gelawêjê (31.07.2013) jî rêûresma bidawîhatina vê kongireyê birêve çû, ku têde rêzdar Foad Xakîbeygî peyama Desteya Birêveberiyê a hilbijartî ji aliyê kongireya 7 ve xwend û di vê rêûresmê de xelat bi ser wan kesan de hate parve kirin ku di dema karê kongireyê de çalakiyek zêde hebû.

Ew rêûresm di dawiyê de jî di nav cejn û govend û xweşiya beşdaran de bidawî hat.

## Nerîna Lîderan



Demîrtaş:

**Bila Turkiye rastiyekê bi navê Kurdistana Sûriyê qebûl bike**



Can kirî:

**Ertêşa Mîsrê bona piştevaniya ji demokrasiyê Morsî ji deshilatê avêt**



Waîl Helqî:

**gelê Sûriyê û rêberên siyasî dizanin ku tenê riya aştiyê gotûbêj e**



Ehme dînijad:

**Min hinek soz dane xelk û alîkarên xwe, lê min kêmtirîn sozên cîbicîkirinê dane wan.**

# Şîva Xerîban

## Beşa:5

Mam Hêmin û hevalên wî xwarina şevê nexwaribûn, û çavnihêrê Bêhrûz û Celal bûn, ku mixabin Celal qet venegeriya, avek sar dane me, ku di rastî de av nebû, belkû gewher bû, şerab bû, hênikatiya ruh bû, Herîf Qadirî xwast ku nan danê, lewra menceleke (beyoşeke) fafonî anî û li ser agir danî, di vê demê de du cêtên şerî bi ser me de derbas bûn û dengê wan li dol û nevalan de bilav bû, di rastî de ew cêt û dengê wan gellek bi xof û tirs bû.

Hevalan bilez ew agir vemirandin. Mam Hêmin got: "Em rêving in, em zû pariyek nan bixon, her ku Bêhrûz vegere, emê ber bi armanca xwe ve bimeşin".

Wan Cêtan bombe neavêtin, û gellek zû winda bûn, lê roja paştir herêma Wawanê bi tundî bombebaran kirin, agir nemabû ku xwarina xwe li ser germ bikin, neçar man ku ew xwarin di gel hinek nanê hişik li pêşberî hevalan danên, di nav mencelê de hinek birincê sar hebû, em ku gellek birsî bûn, me dest kir bi qetandina nanê req û xwarina birincê sar.

Mam Hêmin û hevalan hêşta dest bi xwarina nanê xwe nekiribûn, ku Herîf Qadirî her ku çavê wî kete birincê nav mencelê de, wek vê ku taze ji birîna xwe hesiyabe, bi her du destan nav serê xwe da, û bi hemû hêza xwe kire hewar û got: "Eva ew birince ye ku dema nîvro de, Celal çê kiribû".

Bi vê giriya Celal em hemû giriyan, min ku pêştir ji dûr ve "Şîva Xerîban" dîtibû, niha bi kiryar êdî ez bixwe di nav Şîva Xerîban de bûm, belê eva êdî şîva Xerîban ya rastî bû...

Dost û dijmin li ser şer û pevçûna vê rojê dawerî kirin, bi şahidiya dost û dijminan ew roj roja serkevtineke mezin bû, lê li ber çavê min, ne tenê ew serkevtin nebû, belkû şêweyek têkşikestin bû, jiber ku min bi dil xwe tawanbar dizanî, ew agirê ku min xweş kiribû, û niha jî piştî derbazbûna sî û çend salan, bi ser vê bûyerê de, ez xwe tawanbar dizanim, û azarê dikşînim.

Kak Selah Qeladizeyî piştre gote min ku dema ez li girtîgeha binkeya leşkerî (padgan) a Serdeştê de girtî bûm, çend demjimêran berî îdamê Celal, Celal anîne cem min, û gellek hovane, û bê dadgehîkirin, Celal şehîd kirin, û termê wî jî nehate dîtin, û cihê gora wî jî heya niha ne diyar e.

Eva yekemîn û dawî şakara Komara Îslamî a Îranê nebû, belkû sedan û hezaran destegulên din li Kurdistanê de dane avê.

Bi navê Xwedê, eva taze destpêka karesat û cînayetan bû, niha êdî demsalek din ji bidarvekirinên bê dadgehîkirin ya dîlên şer, û kuştara gişt girtiyan û civatên bê tawan ên Kurdistanê dest pê dikir. Piştî bê serûşûnkirina Celal, dehan û sedan zincîre kuştar, û reşekujî û cînayet û kavilkariyên bê veqetiyan li pey yektir dihatin.



Gellek ji gund û bajaran bi xwînê hatin sorkirin, û gellek rez û bax hatin şevitandin, û xwezaya Kurdistanê bê serûber kirin, heta serê çiyayan jî kun kunî kirin, û kirne çepera jîndarkujî û Kurdkujiyê, lê bi dana bacek yekcar zor.

Heya niha bi kiryar şerê sê heyvî di hemû nuqteyeke Kurdistanê de dest pêkiribû, lê bi îfadeya berdewam ya rojnameyên fermî ên dewletî ên wê demê Serdeşt qada germ ya şer dihate binavkirin.

Li ser şerê sê heyvî hinek kesan hin tişt nivîsandine, lê piraniya wan ji rastiyê dûr in.

Di şerê sê heyvî de li raserî Kurdistanê de em ketne nav şereke nexwastî de, û xortên Kurd bi giştî dest li ser dest nedanîn, di hemû nuqteyan de berbûne canê zordaran, û ew fîdakarî û cangorîtî bû sedema vê ku dijmin bo gotûbêjan razî be, û reng û rûyê aştîxwazane a Kurdan gellek bi eşkereyî derket, wan bi tewahî selimandin ku şerxwaz nînin.

Piştî bêhnvedanekê ku bi baweriya gellek kesan bi qazancê her du aliyan û zêdetir bi qazancê Komara Îslamî a Îranê bû, carek din rejîma Îranê bi hêza teyartir û piştevaniya zortir, bê rehmanetir, dest bo kuştarê bir.

Mixabin vê carê şîpela nîv sor û kalbûyî, û reng jêçûyî ya beşek ji peyrewên bîrokeya Înternasyonalîstên bi nav çepên Îranî pêre bû, lê di Kurdistanê de beşa xwe jê vekir. Li wir de wek vê ye ku ez pê li ser cergê xwe danêm, nîva vê girûpa ku ez hatme nav refê de, bi salan, ew mil bi mil, û dostê min ê nêzîk bûn, û di gellek waran de, wek mamosta û cergşevitiyê xwe min hisab ji wan re kiriye, û niha jî piştî nemana wan min, rêz û hurmetek taybet bo wan heye.

Heya dawiya şerê sê heyvî û destpêkirina berengariya nû, ji nû ve tenê jînosayda Qarnê û Qelatan rû dabû, li qonaxên şerfiroşiya Komara Îslamî de, dehan jînosaydên mezin rû dan, û Îraq û Îranê şer kirin, celladên nav hêzên wan du welatan sitranên merg û komkujiyê li ber yektir digerandin, îca goviya Sedam û dar û destkên wî bû, wan bêşermanetir dest pê kirin, wan çîroka hovane û pirr ji şerm ya enfalan di dîroka xwe de bi cih kirin.

Gellek kes dermanxwarî kirin. Gaza Xerdel û barana zer bi ser Helebçe û Serdeşt û dehan cihên din ên Kurdistanê de barandin.

Gul û giya û dar û daristan bi kîmyabaranê ji nav birin, lê bi xweşî ve Kurd her maye û li ser xebata xwe her wa berdewam e... Dom heye

# Kurdistana Rojava û rewşa hestiyar

Şehab Xalidî






Cuda ji civîna li Hewlêrê ya di navbera PYD û Elpartî ku li ser daxwaz û banga Birêz Mesûd Barzanî hate lidarxistin, û cuda ji şerê di navbera Eniya Elnosret di gel PYD û herweha bilindkirina alaya Desteya Bilind a Kurd li sînorê Cîlan Pinar ya Sûriye û Turkiyê, basa ragehandina xwebirêveberiyekê bo Kurdistana Rojava jî yek ji basên herî germ di vê para Kurdistanê de ye, ku her ji nah de helwest û dijkiryarên curbicur di navxwe û dervey de, li pey xwe hebûne.

Hinek aliyên bi bandor di Kurdistana Rojava de her di vê derheqê de reşnûsek di 60 maddeyan de amade kirine, ku hinek ji xalên wê ên giring weha ne:

Maddeya 3: Ev peymana Sûriyê bi welateke serbixwe, û xwediyê serwerî û yekparçeyiya erzî û bi pêtextiya Dîmeşqê, û bi sîstemeke demokratîk a parlemanî a çend hizbî û federalî nas dike.

Rojavayê Kurdistanê di warê coxrafî û îdarî de wek beşek neveqetiyayî ji xaka Sûriyê ye û bajarê Qamîşloyê jî herêma demokratîk ya xwebirêveber e.

Maddeya 31: Endamên parlementoyê li gorî her 20 hezar kesî, 1 endam dibe, bona vê ku nûnertiya tewahiya gund û bajarên sînorê herêma xwebirêveber bike.

Maddeya 39: dewlet ji serokek jin yan mêr, û 20 wezîran pêk tê, ku bi piraniya dengan ji aliyê parlementoyê ve tê hilbijartin.

Derheq bilavbûna vê reşnûsê de yek ji serkideyên PYD bi navê Nasirê Hecî Minsûr di gotûbêjekê de di gel malpera Kurdpress ragehandiye ku, biryar nebû ew reşnûs weha zû bihê bilavkirin, jiber ku karê wê mabû, lê bona cîbicîkirina wê, û danîna dawî modelê bo xwebirêveberiya Kurdistana Rojava, emê di gel hemû partî û aliyan û heta di gel cîranên Sûriyê jî emê hemşêvriyê bikin.

Salih Muslim hevserokê PYD jî ragehand ku em daxwazê ji hemû part û aliyên Sûriyê dikin ku boçûnên xwe li ser vê deqa bilavbûyî eşkere bikin.

Jiber ku em dixwazin pêkve kar bo ragehandina xwebirêveberiyekê bikin.

Bilavbûna vê nûçeyê wek hemû carê helwesta herî tund ya karbidestên Turkiyê li pey xwe hebû.

Wezîrê Karê Derve yê Turkiyê di vî warî de ragehand:

"Heke herêmeke serbixwe ya Kurd bihê ragehandin, wê demê Ereb wê dijayetiya PYD bikin û şerê navxweyî wê rû bide, ku eva jî dikare taktîkek ji aliyê Beşar Esed ve be, bona vê ku Kurdan dijî opozisyona Sûriyê bi kar bîne.

Heke Kurd karek weha bikin, eva aliyên din jî wek Kurdan wê hewara xwe bibne ber bijardeyên bi vî awayî".

Bêguman mafê Kurdan di vê beşa Kurdistanê de ye ku hemû pêkve kar bo avakirina herêmekê xwebirêveber bikin û berjewendiyên neteweyî wan weha pêkve girê bide ku êdî dawî bi wan hemû kêşe û nakokiyan bê, û vê derfetê ji dest nedin.

Ew yekîtiya di navbera wan de dikare pîlanên neyarên Kurdan yek bi yek pûç û bê bandor bike û wan neçar bike ku rêya dostatiyê bi Kurdan re bigirne pêş.

Her wek herêma Kurdistanê ku serdemekê ji aliyê cîranên wê ve bi çavek dijminkarî lê dinihêrîn û pîlanên cubicur jêre darêtin, lê ew siyaseta dostane û aştîxwazane ya birêveberên vê herêmê ew neçar kirin ku tê bigihîjin ku berjewendiya wan di dostatiya bi Kurdan re ye, ne di dijminkariyê de.

Bê guman li Rojava de jî Kurd dikarin vê herêmê ji xwe re bikne mînak û bi vî awayî bextewerî û xêr û xweşiyê bo kurd di hemû beşên kurdistanê de xwe bidestve bînin.

## 700 milyard dolar xisar li pîşesaziya petrola Îranê ketiye



**Li gorî nûçeya malpera "Ayendê news", texmînên karnasî nîşan didin ku di dewleta heşt sale ya Ehmedînijad de 700 milyard dolar xisar li petrola Îranê ketiye.**

Li gorî vê raporê herçend ku dewletên neh û deh di wan heşt salan de dahata herî zêde ya petrolê hebûne, û du hemberî dewletên piştî şoreşa Îranê dahat bi dest xistine, lê dewleta Ehmedînijad bi sedema xirapiya birêveberiyê nekarî ku bernamerêjiyên xwe bi awayek dirust bigehîne encamê.

Herweha xirapiya birêveberiyê di Wezareta Petrolê de bû sedema vê ku berhemanîna petrolê û randimana behrewergirtina ji qadên petrolê gellek bê xwar, û niha heke tehrîm jî nebin, welat nikare 4 milyon bermîlên petrolê di rojê de berhem bîne.

N: Tomas Îrdbirînk

W: Mo'tesem Nûranî



# Pêwendiya di navbera Îran û Amerîka

Tehran - Rêberê payebilind ê Îranê Elî Xamineyî aveke sar bi ser hemû wan hewl û tekoşînên wan dawiyane de dakir ku bona cardin destpêkirina pêwendiyên dîplomasî di navbera Îran û Amerîkayê hatibûn dan. Wî got ku bona vê ku li gotûbêjan dem bigîjin lihevhatinekê ez ne geşbîn im, herçend li ser mijarên giring wek kêşeya programa navikî û aloziyên Sûriyê gotûbêj ret nekir.

Roja Yekşemiyê di civînekê de ku bi boneya bidawîhatina dewreya serkomariya Ehmedînijad û kabîneya wî pêk hatibû, Xamineyî ragehand ku ez li ser vê baweriyê ninin ku gotûbêja rasterast li gel Amerîka encamek baş li pey xwe hebe. Herweha got ku Amerîkayî cihê baweriyê nînin.

Gotinên wan naçe mejiyê mirov de û di reftarên xwe de rast nînin. Dîtingehên wî li ser Amerîkayê li ser bingeha gotûbêjên pêşîn e, jiber ku ew li ser vê baweriyê bû ku gotin û kiryarên wan ne wek yek e. Ew firt û fêlan dikin, wek wan kêşeyên ku li Îraqê de bi cih hêlane.

Hesen Ruhanî serkomarê hilbijartî ku roja 13'ê Gelawêjê (04.08.2013) li Îranê de deshilata serkomariyê bidestve girt, li dema rikeberiya hilbijartina serkomariyê de gellek pasaw anîn ku heke bibe serkomar, hem di navxwe û hem jî di siyaseta derve de wê guherînkariyan pêk bîne. Wî got weha baş bû ku di gel "serokê Gund" axavtin kiriba.

Merema wî ew bû ku em giringiyê bidne gotûbêja rasterast bi Amerîkayê re. Di cihê gotûbêja bi Ewropiyan re, em bi Amerîkayê re bikevin nav gotûbêjan de.

Di rêûresma sondxwarin û dest bi kar bûna Rûhanî cuda ji Amerîka û Îsraîl hemû welatên cîhanê hatibûn bangkirin.
Du hefteyan berî niha 131 endamên kongirêsa Amerîkayê nameyek îmze kirin ku ew name bi nûnertiya Çarlî Dênt Komarîxwaz û nûnerê Pênsêlwaniya û Deyvîd Ey Pirays yê Demokrat û nûnerê Karolînaya Bakûr hatibû nivîsandin, ku dane serok Obama. Di vê nameyê de Obama hay dabûn ku niha Rûhanî bûye serkomarê ranê û ew rewş baş e ku vê derfetê ji dest nede û ji riya gotûbêjan ve kêşeyan bi Îranê re çareser bike.

Herçend beşek zêde ji endamên kongrêsê li ser vê baweriyê ne ku divêt dorpêç û tehrîmên li ser Îranê zêde bin da ku karbidestên wî welatî guh bidin rewşa aloz ya abaorî ya Îranê û dest ji progerama navikî hilgirin.

Her ew yek jî bû sedema vê ku li hefteya borî de kongrêsa Amerîkayê gelaleyek nû ya tehrîmên bi dijî Îranê pesend kir ku wek yek ji tehrîmên herî tund tên hesibandin heke ji aliyê Senaya vî welatî û Obama ve bêne îmzekirin.

Lê gelo Xamineyî ku biryra dawiyê di destê wî de ye got ku Amerîkayî ji aliyekê ve bas ji dostatiya bi xelkê Îranê re dikin, û ji aliyek din ve dest kirine bi gemaroyên berfireh ên bankî û neftî li ser Îranê, û tevî wan hemû kiryarên dijminkarane pêdagir e li ser vê ku nabe dijmintiya wan bihê kirin.

Hemîdriza Tereqî çalakvanê siyasî ê nêzîk bi Xamineyî bas ji tehrîmên aborî kir ku ji aliyê Amerîkayê ve bi ser Îranê de hatine sepandin û got: "Nivîsîna nameyekê ji aliyê kongirêsa Amerîkayê ve bo serokê vî welatî bi tenê bes nîne, ew bo nîşandana niyetpakiyê divêt tehrîman hilgirin, ku ew yek dikare çiraya kesk ya rastîn be bona bidawîanîna kêşeyan".

Xamineyî û derdorên wî û alîgirên wî gellek caran xwazyarê vê yekê bûn ku Amerîka bona nîşandana niyetpakiyê dest bike bi nehêştina tehrîmên aborî û tola wan hemû ziraran veke ku gehandiye Îranê, û şaşiyên xwe ên dîrokî qebûl bike, wek derbeya endazyarîkirî ji aliyê Amerîkayiyan li sala 1953'an de, û xistna balafireke medenî a Îranê li sala 1988'an de.

Kesên nêzî wan gotin ku Xamineyî li sala 1989'an de bûye rêberê paye bilind ê Îranê û rê bi wî hatiye dan li ser hinek ji lihevhatinên veşartî û aborî gotûbêj bê kirin, ku piştgirî û zanyarî dan bi bereya şerê dijî Taliban bû di sala 2001'an de Amerîka li Efxanistanê de birêve dibir û avakirina du dewletên Efxanistan û Îraqê.

Roja Yekşemiyê Xamineyî pêdagirî li ser axavtinên xwe kir ku Îran amade ye li gel welatên cîhanê gotûbêjan bike ku eva yek ji sozên sereke ên hilbijartinên serkomariyê bû, ku têde Rûhanî pêyman û soz da, lê Xamineyî got: "Heke merem ji reftar û gotûbêjan ew be ku em paşvekêşanê ji armancên xwe bikin eva tê wateya têkşikana me".

Yek ji nêzîkên ser bi baskê Rûhanî derheq vê rewşê axivî, û nexwast ku bi sedema hestyariya rewşê xwe bide naskirin û got ku jêve bûye ku axavtinên Xamineyî bona piştevanîkirina ji serkomarê nû ye ku dibêje: " Eva eşkere ye ku em bo gotûbêjan amade ne. Heke aliyê din rave bike ku encama wan gotûbêjan çi dibe".


Di Îranê de li gorî Yasaya Bingehîn a welat rêber siyaseta sereke ya vî welatî diyarî dike û hemû deshilat li kontrola wî de ye.
serkomar nikare biryara dawiyê bide, û Îran û Amerîka li Rojhilata Navîn nakokî bi hevre hene, renge çareseriya wan kêşeyan ne hêsan be.

**www.NYTimes.com**



**“Sala 1363’an (1984)dema ku Komara Îslamî dixwast cardin bajarê Banê ji destê pêşmergên Kurdistanê derbixe, li ser rêya Bane û Serdeştê, li cihekê bi navê “Merdekan” şer ket navbera pêşmergên Partiyê û hêzên Komara Îslamî û mixabin di encama wî şerî de 7 pêşmergên qehreman ên PDK Îranê şehîd ketin û di hembere de jî pitir ji 120 kes ji çekdarên ser bi Komara Îslamî bûne goriyê siyasetên şarxwazane ên rejîmê, ew roj bi sedema şehîdketina wan 7 pêşmergên partiyê, roja herî nexweş a jiyana min e û tu caran nikarim wê rojê ji bîr bikim”.**

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî



Seyîd Necmeddîn Haşimî naskirî bi Seyîd Necme kurê Seyîd Hesen, sala 1337’an (1958) li gundê “Qayberd” a ser bi bajarê Banê di malbatek nawendî de tê dinê.

Seyîd Necmeddîn li dor despêka çêbûna têkiliyên xwe bi siyaset û xebata netewî re weha dibêje: “Di despêka sala 1357’an (1978) de, dema ku nîşaneyên serhildana gelên Îranê hêdî hêdî xwe derdixistin, birayê min Seyîd Îbirahîm Haşimî ku wî çaxî endamê PDK Îranê bû û tevî Haşim Kerîmî û kadr û pêşmergên din ên partiyê karê nepenî dikir, dihat û ji me re basa şoreşa 46 û 47’an dikir û birêveberên şoreşê berevajî rejîma Paşatiyê ku ew bi “Çete” nav dibirin, lê ew bi mirovên xebatkar û xwedî îman didan nasîn, lewra eva bû despêkek ku ez xebata netewî û tevgera Kurdî bi giştî û PDK Îranê bi taybetî nas bikim”.

Seyîd Necme hewreha dibêje: “sala 1358’ê, min li bajêrvaniya bajarê Banê weke Gorûhban kar dikir, hevdem digel bidawîhatina şoreşê tevlî refên nepenî ên PDK Îranê bûm û min tekoşîna xwe a siyasî dest pêkir.

Xebat û tekoşîna min dewam kir heya Havîna sala 1359’an (1980), dema ku gumana hevkarîkirin tevî PDK Îranê li ser min çêbû, revîm û min xwe bi komîte şarisatana Banê li gundê “Germaw”ê nasand û çeka şeref a pêşmergatiyê avêt milê xwe”.
Seyîd Necmeddîn roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: “Sala 1364’an (1985) dewreya kadriya pile 4 ji bo pêşmergên partiyê û bi beşdariya 46 kesan dest pêbû ku yek ji wan kesan ez bûm.

Di roja despêka dewrê de em haydar kirin ku hemû beşdarên dewrê rêz bin, me pirsyar kir ku çima rêz bin? Di bersiva me de gotin ku wê mêhvanek qedir giran bê, piştî rêzbûnê ji nişkê ve Dr. Qasimlo ji sûyê derket û tevî hemû beşdarên dewrê dest da û ji rewşa me hemûyan pirsiyar kir, paşan her di wê dewrê de jî Dr. Qasimlo di sê beşên cuda de waneyên cur bi cur ji me re gotin.

Eva rojên herî xweş ên jiyana pêşmergatiya min in, jiber ku min heyamê 40 rojan karî ku rêberê xwe ji nêzîk ve bibînim û waneyên jiyan û xebatê jê hîn bim”.

Herweha derheq rojên herî nexweş ên jiyana xwe jî weha diaxive: “Sala 1363’an (1984) dema ku Komara Îslamî dixwast cardin bajarê Banê ji destê pêşmergên Kurdistanê derbixe, li ser rêya Bane û Serdeştê, li cihekê bi navê “Merdekan” şer ket navbera pêşmergên Partiyê û hêzên Komara Îslamî û mixabin di encama wî şerî de 7 pêşmergên qehreman ên PDK Îranê şehîd ketin û di hembere de jî pitir ji 120 kes ji çekdarên ser bi Komara Îslamî bûne goriyê siyasetên şarxwazane ên rejîmê, ew roj bi sedema şehîdketina wan 7 pêşmergên partiyê, roja herî nexweş a jiyana min e û tu caran nikarim wê rojê ji bîr bikim”.

Seyîd Necmeddîn derheq jiyana xwe a hevpar dibêje: “Sala 1372’an (1993) min tevî Elmas Mehmûd, li Komîte Şaristana Banê li Tanceroyê jiyana hevpar pêk anî û berhema jiyana me jî, du kur in”.

Piştî pitir ji 30 salan, Seyîd necmeddîn dibêje: “Çavnihêriya min ji PDK Îranê ev e ku bikare bêtir siyaset û boçûnên xwe bi cîhana derve û xelkê Kurdistanê binasîne”.

Seyîd Necmeddîn peyamekê ji bo xelkê Kurdistanê dişîne û têde daxwazê ji xelkê dike ku PDK Îranê bi partiya xwe bihesibînin û tevlî refên wê bin û hereweha rû li wan kesan dike ku ji aliyê Komara îslamî ve hatine xapandin û çeka cerdevaniyê (caşitî) kirine milê xwe û dibêje: “ Çeka rejîmê danên û cardin vegerin nava xelkê xwe de, jiber ku dawiya cerdevanî û xwefiroşiyê hertim risvayî ye”.

Seyîd necmeddîn bi vê hêviyê gotinên xwe bi dawî tîne:” Hêviya min ev e ku rojek bê û partiya min û pêşmergên wê ên qehreman bi serbilindî vegerin neav welat”.

# Jinên ducanî ên xemok li xwekûjiyê difikirin



**Di encama lêkolînekê de ku li ser 260 jinên ducanî hatiye encam dan, eşkere bû ku yek li ser sê ji jinên ducanî ku bi dirêjahiya ducaniya xwe digel xemokiyê berbirû dibin, dikevin hizra xwekûjiyê de.**

Vê lêkolînê herweha eşkere kir ku %80 ji wan jinên ku bi dirêjahiya dewrana ducaniya xwe digel xemokiyê berbirû bûne, piştî zarokbûnê jî her wusa xemok dimînin.

Nêzîk bi %56 jinên beşdar di vê lêkolînê de, di yekemîn car ducanbûna xwe de tevî pirsgirêkan berbirû bûne û nêzîk bi %66 jî ragehandine ku bi dirêjahiya cara duhemîn a ducanîbûna xwe jî digel xemokiyê berbirû bûne.

Pitir ji nîviya jinên beşdar di vê ceribandinê de jî ragehandine ku xemokiya wan bandor xistiye ser peywendiyên wan tevî zarokên xwe û herweha %38 jî ragehandine ku di damezirandina peywendî tevî zarokên xwe de, digel pirsgirêkan berbirû bûne.

Eva di demekê deye ku tenê %22 ji wan jinan piştî sehkirin bi pirsgirêkên xwe ên derûnî, seredana pizişkê taybet kirine.

# Gelo jinên herî bilin ên dîroka mirovahiyê, kî ne?



1. "Têrcntêc Kîfir" jina herî bilind a cîhanê ye ku bi sedema nesaxiya penceşêrê canê xwe ji dest da. Kîfir bi bejna xwe a 256 sm, weke jina herî bilind a dîroka mirovahiye hate nasîn.
2. "Zîng Cînliyan" hemwelatiyê welatê Çînê, ku li vir bi mirovên bejin kurt tên naskirin, xwediyê bejna 249 sm bû, lê mixabin di temenê nûciwaniya xwe de canê xwe ji dest da.
3. "Cîn Banford" bi bejna xwe a 244 sm, jina herî bejin bilind a welatê Berîtanyayê bû ku di temenê 28 saliyê de canê xwe ji dest da.
4. "Katîla Dawîla Rodrîgêr" jina herî bilind a welatê Birizîlê bû ku bi bejna xwe a 243 sm, di sala 2001'an de canê xwe jidest da.
5. "Yaw Dîfin" hemwelatiyê 237 sm'î a Çînî bû ku mixabin bi sedema bilindtir bûna bejnê canê xwe jidest da.
6. "Sandî Alîn" jina herî bilind a welatê Amerîkayê bû ku bi bejna xwe a 234 sm, di sala 2008'an de canê xwe jidest da.
7. "Mariya Wîlîşyana Santo" hemwelatiyê Birizîlê û xwediyê bejna 225 sm e.
8. "Zêneb Bîbî" hemwelatiyê Pakistanî ye ku bi sedema bejna xwe 220 sm neçar ma ku ber bi Berîtaniyayê koç bike.
9. "Malgorzata Daydik" bi bejna xwe a 219 sm yek ji lîstikvanên herî navdar ê Beskitbolê bû ku di temenê 37 saliyê de canê xwe jidest da.
10. "Siwîtlana Snay" hemwelatiyê Hindûstanê ye ku bi bejna xwe a 219 sm tevî mêreke 204 sm'î jiyana hevpar pêk aniye.

# Di Pûşpera îsal de 139 hevwelatiyên Îranî û Efxanî hatine Îdamkirin



**Li gor nawenda serjimêriya nûçegehaniya Ajansa kurdpa, di despêka Îsal de heya dawiya meha Pûşper 245 kes hatîne Îdamkirin ku ser hev 139 kes tenê di meha Pûşperê de hatine Îdamkirin.**

Herwusa pêka vê serjimêriyê tenê di Pûşperê de 62 kes di zîndana Qizilhisar û Recayîşara Kerecê de hatine îdamkirin û hukmê îdama sê zîndaniyên din jî li Kerec û Ehwazê di nav xelkê de birêve çû.

ji aliyek din ve ji wan 139 kesên ku di meha Pûşpera îsal de hatin Îdamkirin, 12 kes Efxanî bûn.

Ev serjimêriya bi piştgiriya serjimêriya Ajansa Kurdpa tê bilavkirin, herwusa bi nebûna medyayên azad di Îranê de û îdamkirina nepenî ku di zîndanên Îranê de tê birêvebirin, belkî serjimêriya rast ji vê jî zêdetir be.

# Jinên ekter ên herî giran ên Holîwodê

**Jêderan eşkere kir ku "Ancilîna Cûlî" ektera herî giran a sînemaya Holîwûdê ye û di çend salên derbazbûyî de xwediyê dahata pitir ji 33 milyon dolarî bûye.**

Piştî Ancilîna Cûlî, xwediyê xelata Oskar a îsal "Cinîfêr Lawrêns" bi dahata 26 milyon dolarî di pileya duhemîn û "Kirîstin Istiwart" bi dahata 22 milyon dolarî di pileya sêhemîn de ye.

"Cinîfêr Anîston" hevjîna berê ya"Bired Pît" bi dahata nêzîk bi 20 milyon dolarî di pileya çaremîn û, "Ama Aston" ku di fîlma "Mêrê wek dapîrojkê" de tevî hevjîna xwe "Andro Garfîld" derketin ser ekranê, bi dahata pitir ji 16 milyon dolarî di pileya pêncemîn de ye.

"Sandra Bolak" ku sala borî di pileya sêyemîn de bû, bi dahatek pitir ji 14 milyon dolarî di pileya heftemîn û, "Cûliya Robêrts" bi dahata pitir ji 11 milyon dolarî di pileya dehemîn de ne.

"Mîla Konîs" bi dahata 11 milyon dolarî ekterek taze kar e û îsla bo cara yekemîn di pileya nehemîn de cih girt û du fîlmên ku navbirî tê de lîstiye, bi giştî li ser asta cîhanê xwediyê dahata yek milyar dolarî ye.




## Kangehek zêr li devera Pîranşarê hat dîtin

Sêyemîn kangeha zêr a parêzgeha Urmiyê ku xwediyê 196 hizar ton zêrê eyar 1.38 e, li gundê "Xirape"ya ser bi bajarê Pîranşarê hat peydakirin.

Parêzgeha Urmiyê li ser asta Îranê di warê kangehên zêr de di pileya yekemîn de ye û hemwelatiyên wê parêzgehê jî, ji vê yekê dilgiran in ku dahata kangehên zêr ên parêzgeha wan, li parêzgehên din ên Îranê tên serifkirin.

Hewceyî basê ye ku kangeha "Aqdere" a ser bi bajarê Tikabê, piştî kangeha Îsfehanê, duyemîn kangeha zêr di Îranê de ye ku salane 2 ton û 200 kîlo zêrê eyar 3, jê tê derxistin û herweha kangaha "Zere Şivan" jî, xwediyê 7 milyon ton kevirê zêrî ê eyar 5 e.



## Ziyaretgeha dîrokî ya Hacer Xatûn ji aliyê Îdareya Ewqaf a parêzgeha Sinê ve hat herifandin


Birêveberê giştî ê îdareya Mîrata Çandî yê Sine ragehand ku îdareya Ewqaf a parêzgeha Sinê bê vê ku moletê wergire, qebrê Hacer xatûn herifand.

Qebrê Hacer Xatûn yek ji şûnwarên netewî ên Îranê de hatiye tomarkirin û îdareya Ewqaf a Sinê di dema herifandinê de moleta yasayî ji îdareya mîrata çandî wernegirtiye.

Ziyareta Hacer Xatûn yek ji kevintirîn şûnwarên dîrokî yên kurdistanê ye ku li şeqama Selahedîn Eyûbî li bajarê Sine, li taxê Sertepole hilketiye.

Bi gotina hevwelatiyan Hacer Xatûn xûşka Îmam Riza ya Meşhedê ye û di seferekê de ku bo kurdistanê kiriye canê xwe ji dest daye û her li kurdistanê jî hatiye veşartin.

Mizgefta Hacer Xatûn wek şûnwarên geştyarî û kevn û dîrokî yên bajarê Sinê hatiye naskirin, lê bi sedema kêmxemiya berpirsên rejîma komara Îslamî a Îranê, ber bi jinavçûnê diçû ku di wan daviyan de bû armanca îdareya Ewqaf a parêzgeha Sinê û bi tevahî ji nav çû.



## Gotinên Pêşînan

A. Çiya Mazî



**Ceh qet nebûye genim :**

Tiştên di xwezayê de cîh digirin giş ji hevdû cûda ne,lê hinek tişt hene ku dişibin hevdû ,hinek tişt jî hene ji hevdû pir dûr in û mirov qet wan nikare bide ber hevdû. Mirovên baş û nebaş,mêr û jin ,zarok û mezin,rastî û derew hwd.

**Cer nû ye kes nabêje heqê wî çi ye:**

Cerê ku mirov nû dikire herkes ava wê ji ber ku cemidiye vedixwe. Lê kes nabêje te bi çi kirî. Lê dema kevn dibe ava wî germ dibe,îjar yê ku dibêje te biha kiriye,yê ku dibêje cêrê te nebaş e. Tiştekî ku mirov nû bikire herkes dixwaze sûdeyê jê bibîne û di serî de baş e. Lê dema ku kevn dibe kes bi kar nayne.

**Cîhê destê te herî ye lingê xwe jî têxiyê :**

Dema mirov ji bo pirsgirêkekê çareser bike,mirov li qulpekê digere an li çirûskeke ku wê çareserî çêbibe digere,dema mirov wê çirûskê dibîne mirov xwe lê dişidîne,ku mirov bi serî girt dawiya werîs wê bi xwe bê an mirov destê xwe xist qelşê, mirov piyê xwe jî têxe bin erda ku careke din neyê girtin.

**Cilê terziyan tim qetiya ye:**

Wekî mirovên pîşekar tim hewl didin ku karê xwe yê pereyan tîne bikin,tiştên pera neyne guhê xwe nadinê.Ji ber wê yekê jî tim tiştê pereyan neyne bi derengî dixin û dibêjin: yê min hêç e,bila ez yê mirovan xelas bikim ,yê min dûre. Lê her ku yekî xelas dikê yekî din li pey tê.


# Şaristana Serpolzehab

Şaristana Serpolzehab yek ji şaristanên kevnar yên parêzgeha Kirmaşanê ye ku panahiya şaristana Serpolzehab 1271 kîlometra çargûşe ye û li rojavayê parêzgeha Kirmaşanê hilketiye ku ji aliyê bakûr tevî sînorê Ciwanro, ji aliyê başûr tevî Qesrşîrîn û sînorê Îraqê, ji aliyê rojhelat tevî Îslamava, ji aliyê rojava tevî şaristana Gîlana Rojava hevsînor e. Bajarê serpolzehab nawenda şaristana serpolzehab e ku li ser rêya navnetewî ya Têhran û Bexda bi navê rêya Kerbela bi kevnaretiya 2800 sal berî zayîna Mesîh hilketiye.

Şaristana serpolzehab xwezayek ciwan, û av û hewayek xweş heye û serçaveyên ava wê jî zaf in û rûbarê Elwend jî ji vê şaristanê re derbaz dibe.

Serpolzehab li du peyvan pêk tê ku di ferhengê de peyva zehaw bi wateya ava dilopî hatiye û herwusa bi wateya kanî û serçaveyên avê jî hatiye û peyva serpol jî navê pirekê ye ku li ser rûbarê Elwend hilketiye.

Ev bajare zaf kevn e û kevnariya vê bajarê vedigere bo serdemê Mad ku bi gotina şarezayan piştî Îslamê navê wî Helwan bû ,jiber ku li cem bajarê kevnar yê





A: Adil Muradî

Helwan hatiye avakirin û niha jî li nêzîkiyê bajar kelhek xirabûyî heye. Her di berê de jiber ku ew bajar bajarek sînorî bûye û zêde kelh li wir hatine çêkirin, lê di dema êrîşa Ereban bo ser Îranê, ev kelh ji nav çûn û niha jî pêpikên xirabûyî ên kelhan maye, lê Aşoriyan jî digotne wê bajarê Kalmanû. Pêka vekolînên şûnwarnasan kevnariya akinciyên vê bajarê vedigere bo 7 hezar sal berî niha û nivîsînên ser kevirên "Anûbanî Nî" paşahyê Loloyî yan ku li ser kevirên zincîre çiyayên Zagiros, Dûkan Dawûd, Taqgera û bi dehan şûnwarên kevnar û dîrokî hatine nivîsandin û bi ciwanî tê xûyakirin û bi awayekê ku ketîbeya "Anûbanî Nî" yek jî kevintirîn û yekemîn hunera mi'marî ya Asiya li vî bajarî ye.

Serpolzehab li du peyvan pêk tê ku di ferhengê de peyva zehaw bi wateya ava dilopî hatiye û herwusa bi wateya kanî û serçaveyên avê jî hatiye û peyva serpol jî navê pirekê ye ku li ser rûbarê Elwend hilketiye.

Hêjayî gotinê ye ku vê şaristanê ji ber hebûna axek baş û av û hewayê baş zêde berhemên çandinê hene, wek Genim, Ceh, Tirî, Hinar, Hejîr, Sêv, Kûncî, Genmok, Hermî û...hwd ku xelk bi piranî mijûlî bax û baxdarî û heywandariyê ne.

# %86 ji xwendekarên Îranê ji rişteya xwe ya xwendinê nerazî ne

**Bi sedema xirapiya rewşa aborî ya jiyana malbatan di Îranê de û hewildana xwendekaran bo hilbijartina rişteyek pirr dahat bo derbazkirina warê jiyana xwe û malbata xwe, %80 ji xwendekaran di 20 rişteyên xwendinê de dixwînin.**

Şarezayeke warê zanista reftarên civakî bi nûçegihaniya "Îlna" ragehand: li gorî lêkolîneke civakî ku li salên 89, 90, û 91'an a Rojî de li ser hejmarek ji xwendekaran hatiye kirin, %89 ji wan xwendekaran tu hêviyeke wan bi rişteya xwendina xwe û heta warên din jî nemaye.

Wî karnasî herweha ragehandiye ku keç li Îranê piştî bidawîanîna xwendina bilind, û kur jî piştî bidawîanîna xizmeta leşkeriyê bîr ji jiyana hevpar dikin, ku li wir de



jî xizmeta leşkeriyê kêşe û arîşe li ser riya ciwanan çêkiriye, û rêjeya pêkanîna jiyana hevpar kêm kiriye.


Pêdagiriya malbatan, nebûna beşên curbicur ên pirr dahat, nebaşiya aboriya malbatan di Îranê de, û çavlêkeriya takên civakên bûye sedema vê ku %80 ji xwendekarên Îranê li 20 beşên xwendinê de xwendina xwe berdewam bikin, û xwendina xwe ya bilind tewaw bikin, ku ew yek jî bi sedema zoriya derçûyiyan kêşe bo damezrandin û bicihkirina wan li nawendên pêwendîdar û li beşên wan de pêk aniye.

Di civaka Îranê de tu demekê daxwazî û selîqeya xwendekar di xwendina bilind de berçav nahê girtin û ji aliyê malbat û hemşêvrên taybetî ên vî warî, bo hilbijartina beşeke paresaz tên haydan.

# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

## Ew keça Mihemedriza Şah û Gûgûş e




**Xanima bi navê "Şadî Pehlewî" di çend rojên derbazbûyî de ragehand ku berhema zewaca nepenî a Mihemedriza paşayê dawî ê Îranê û sitranbêja navdar Gûgûş e.**

Navbirî di malperên Înternêtî de ragehand ku amade ye îdî'aya xwe îsbat bike û herweha daxwaza wê rojê kir ku bikare Gûgûş di nava alîgirên wê de bi çeka Muselsel bikuje.

Şadî Herweha got ku heya niha çenda caran daxwaz ji Kambîzê birayê xwe (kurê Gûgûş) kiriye ku bona ceribandina "DNA" bê Turkiyê.

## Dukturekî Mehabadî bi mirinê jiyan bexşî 15 kesan

**Nexweşekê endamên leşê xwe pêşkeşî 15 nexweşên din kir û canê 15 kesên din ji mirinê rizgar kir.**



Li gor nûçegehaniyan, Dr. Celal Şehîrî yek ji hevwelatiyên mirovdost û bi nav û deng ê Mehabadê ku bi sedema bûyerekê tûşî mirina mêjiyê bibû, 15 endamên leşê xwe pêşkeşê 15 nexweşên din kir û carek din jiyan bexşiye wan.

Dr. Celal Şehîrî di meha Remezana pîroz de, bi kiryarek mirovdostane xelata dinya û qiyametê bidest anî.

## Pêşîgirtin ji serêşê



Bi giştî piraniya xelkê ku tûşî serêşê dibin hewara xwe dibne ber hebên aramkirinê, lê pisporên warê tendurustiyê, dibêjin ya baş ew e ku bona careseriyê ji riyên xwezayî mifahê bistînin.

Li gorî rapora rojnameya "Îndiyen taymz" bi berçavgirtina wan çend xalan em dikarin ku xwe ji serêşê rizgar bikin. Ew jane serên ku bi sedema bê taqetî û bê xevî û mandîbûnê ve çê dibin, eva van rênimayiyan berçav bigrin:

1-Xwarina rêjeyeke zor avê êşa ser kêm dike, û Çaya Ne'nayê jî baş e.

2-Çend hereketên sporê wek helatina hêdî û aram, û helatinek bilez, avjenî û ...hwd dikare hatûçûna xwînê bileztir bike û bandora pozetîv li ser jane serê danê

3-danîna parçe û qumaşek terkirî bi ava sar li ser eniyê dikare serêşê kêm bike

4-kenî jî pirr baş e, çavlêkirina fîlmên komedî û xwendina pirtûk yan kovarekê ku te bikenîne, dikare jana serî ji bîra te bibe.

5-Bêhnvedan û razan bi qasî hewce bo çareseriya wan şêwe êşan baş e

6- ji bilî wan riyên serê hewildan bo xwarina wan xwarina ku Menyezyom û Kelsomek zaf têde ye bo mînak Lobya, û Îsfenac e.